# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (158):

## Gundê "Qermîtliq" û tewanên "Elcasêm", girtinên Gundê "Celemê", pevçûn û dogişên li Efrînê û Reco



















Piştî ku "Salêm Elmislet" bû serokê Kiwalisyona Sûrî - Ixwanî (ya bi ser Partiya Dadmendiyê û Geşepêdanê - Eledalê we Eltenmiyê, û serokê wê Erdoxan ve) bi demeke kurt, wî bi rêkûpêkirina istîxbaratên Turkiyê, li yekê Tebaxê, seredana biryargehên hin Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - Elceyş Elweteniî" kir, û bi germahî û hezkirin bi serkêşên wan re (mîna "Ebû Hatêm Şeqra kujerê Hevrîn Xelef" û "Mihemed Elcasêm - Ebû Emşe kujerê Ehmed Şêxo") hevdîtin çêkirin, û weha berpirsiyariya Hemahengiyê di ber wan de tekez kir.

Vaye emê hin binpêkirin û tewanên ku "Ebû Emşe" û yên ji bilî wî ji nandozên Turkiyê kirine, pêşeber bikin:

**= G."Qermîtliq":**

Bi Navça Şiyê ve girêdayî ye û /3/KM ji navenda wê dûr e, li ser sînorê Turkiyê û Sûriyê û Ro'avayê Bajarê Efrînê dikeve, ji dora /350/malî pêk tê, /1750/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, piştî dijayetiya li ser herêmê li 20.1.2018an zû penaber bûn, piştî şer /122malbat=400nişte/ jê vegerîn û yên din jî hatin koçberkirin, û /150malbat= 800nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin; Lê /6/malbatên Kurd ji yên vegerîne nikanîn malên xwe vegerandana bi ser dandina wan ji vêrgiyên diravî re, vêca neçar bûn li ba merivên xwe rûnin.

Li 26.2.2018an gund hate dagîrkirin, û Milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah" (a ku "Mihemed Hisên Elcasêm - Ebû Emşe" yê Turkman û ji gundewarê Hemê û tundrewtir di girêdana xwe bi Anqerê re û yê ku li ser fermana wê giropên nandoz şandine Lîbiya û Ezerbeycanê, serkêşiya wê dike) destser kir.

"Firqê" /9/malên gund ji xwe re kirin biryargehên leşkerî, "Elcasêm" dest danî ser malên "Malbata Dawod" û merivên xwe têde dan rûniştin, weha vêla"Henîf Dawod kurê Mistefê" malbata xwe têde da rûniştin û derdora xwe kire çarkoşoyeke ewlehî û qedexe kir tu kes têre here û were, û maleke din jî kire hepis û ciyeke lêkolînê bi yên hatine revandin û girtiyan re û herweha işkencekirina wan, mîna tiştê bi hemwelatî "Ehmed Şêxo kurê Mihemed/50/sal - ji xelkê Bajaroka Şiyê" re çêbûye, yê bi ser ku cîgirê serokê encûmena xwecihî li navçê bû û ji aliyê destlatên dagîrkeriyê ve hatibû binavkirin, dîsa jî bi sedema işkencekirina mekin, li 11.6.2018an jiyana xwe ji dest da.

Piştî heftakê ji qedexekirinê, dema ku hin xelkê gund li Avrêla 2018an derbasê bûn, wan dît ku hemî mal ji aliyê wan milîseyan de talan bûne, ji kelûpelan ve bigir ta xwarinvexwarinê, firaxên baqirî, cerên gazê, alavên malan, amûrên elektirîkê...Û H.W.D, herweha wan matorên duloqî, tirektorên çandiniyê, otombîl û acetên çandiniyê jî dizîn, lê piştî dandina xwediyan vêrgiyên diravî /1000-10000/Dolar Emrîkî ew tişt hatin vegerandin; Weha tevaya alet û acetên guvêşgeha zeytûna ya "Henîf Dawod kurê Mistefê" ya li ser riya giştî di navêna Bajaroka Şiyê û Gundê "Erendê" de dizîn, û hin din anîn li şûnê danîn, da ku ji xwe re bi kar wînin; Û herweha jî keblên (kêbil) herdu toreyên elektirîkê û telîfona zemînî yên giştî, giropa hilkêşa ava vexwarinê, û tibabin mezin ji zêtê ji herdu guvêşgehên gund -piştî êrişa hatî ser- dizîn.

"Mihemed Elcasêm" gund ji milîseyên xwe re kire navendeke sereke, weha jî hewşa mala "Mistefa Derwîş" kire embara komkirina tiştên dizînê ji Bajaroka Şiyê û gundên di bin desteseriya wî de, ji acet û alavên giran de bigir, ta tirektorên çandiniyê û acetên wan, otombîl, textên lêkirina stûn û banên avahiyan, acetên hesinkariyê û tiştên din(ên ku hin jê piştî dandina vêrgiyên diravî ji xwediyan re hatin vegerandin û yên mayîn jî hatin firotan); Û mala "Es'ed Hebeş" jî kire embara dizîna zêtê û zêtûna û ta niha weha ye.

Û wî dest danî ser erdên çandiniyê /dora 15 donim/yên malbatên "Heyder û Dehdo" li Başûrê gund, û kire cîgeheke leşkerî ji bo rahênankirina endamên xwe, herweha dora/7/hezar darên zeytûnê yên /11/malbatên ne li gund, û dora /30/donim erdên çandiniyê.

Herweha "Elcasêm" vêrgiyên cûrbecûr li ser xelkê ferz kir, jê /30-50%/ li ser berhema werzên (zêtûn, çiloyê tirî, keskahî, meywe...) yên hemwelatiyên ne li gund, û 15% jî li ser werzên ên li gund, bi ser de jî "baceya zekatê", û demeke dirêj jî li ser her maleke Kurd ku di mala xwe de rûniştî /10/hezar PS weke kirê malê ferz kir, niha jî her demekê /50/ dolarî li ser her maleke Kurd ferz dike, û /35/ kes bi behaneya têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re hatin neçarkirin ku her yek jê hezar dolarî bide.

Û li vê dawiyê milîseyên wî, piştî berdana hin gotinên hinguvkirî li ser vegera hemwelatiyên koçberkirî -bê ku ji aliyê destlatên dagîrkeriyê ve ji bo vegera wan, tu gerante hatibin pêşkêşkirin an pêngavin hatibin avêtin - xelkê Bajaroka Şiyê û derdorê agahdar kirin, ku "Elcasêm" li ber avakirina komîta desteserkirina malmewalên ên ne li gund û hilanîna rêdana (wekalet) ye.

Divê were bîranîn ku dema Turkiyê li Reşmeha sala 2016an dîwarê çementoyî bi kûraniya /25/M di ber sînor re ava dikir, wê /1500/darên zeytûnê yên hemwelatiyên gund hilkirin.

Û di encama êrişa bi ser herêmê de, hin hemwelatiyên gund bûn qurbanî, jê: Hemwelatî "Ehmed Hisên Beklero/65/sal" û hevjîna wî "Qudret Beklero keça Ezet/58/sal" di bombebarana balafirên Turkiyê de, ji rêbenda Gundê "Turindê" re - Başûrê Efrînê, di dema penaberiya komane de, li 16.3.2018an, û weha jî "Elî Ehmed Qadî/60/sal" bi sedema teqîna bombeyeke zemînî li gund, li destpêka Avdara 2018an; Herweha jî "Mihemed Hecîko kurê Henên/30/sal", ji Avdara 2018an ve wendayî ye, û xwedî tu tiştî li ser nizanin.

Û milîseyên "Elcasêm" cîgehên kevneşopî li derdorê gund bi alavên giran kolan û nirxbuhayên wan dizîn, jê: Cîgeha "Xirabê Elî Zênê" - Bakur Rohilatê gund.

Û "Firqê" dil heye gundekî niştecîbûnê yî nimûneyî li Cîgeha "Lêçe" ya di navên herdu gundên "Qermîtliq û Çeqelê Jêrin" - Navça Şiyê de ava bike, da ku niştecîkirina anîndeyan û malmedankirina wan kûr û rewa bike, û ji bo wê riyeke nû ji çateriya Gundê "Mistika" de hate vekirin, û bi bermayên perçekeviran hate raxistin û kutan, bi ser de jî binevahiya wê tê hazirkirin.

Û milîseyên wê dara tûyê (ya temenmezin û bi "Dara Mistê" li gund tê nasîn, sî pir, mirov û lawiran ji germa Havînê diparast, û gelek bîranînên wê yên xweşik li cem xelkê gund hene) şewitandin û qut kirin.

Û berî salekê wê ava ji xweberê ji kaniyên "Kilisiyê û Şiyê" diherikî firotin cotariyan -her şeveke avdanê bi/15/hezar PS- û hin caran jî ew ji avdanê qedexe dikirin.

Weha jî xelkê gund rastî rengereng binpêkirin û tewanan hatin, jê: Revandin, girtin, kêmrûmetkirin, işkencekirin, û vêrgî û baceyên ku hin caran digihîşte bîst hezar dolar.

Û "Sêf Eldîn Casêm" birayê "Mihemed Elcasêm" jî zordariya xwe li ser gund dimeşîne, û dema ku bixwaze hemwelatiyekî bêşîne, di bin çi behanê de be, ew lêdixe û rûmeta wî dadixe.

**= Girtinên bêsûcane:**

- Li 1.8.2021an, "Hemîd Zekî Hesen/22/sal" ji xelkê Gundê "Zaretê", - Şêrewa (yê ku di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de), li dema ku bi dizî derbasî Herêma Ezazê bûye da ku ji wir jî derbasî xaka Turkiyê bibe û derkeve derve, ji aliyê milîseyên bi ser dagîrkeriya Turkiyê ve hate girtin, û ta niha li cem wan bendkirî ye.

- Li şeva 10.8.2021an, Milîseyên "Asayişa Leşkerî li Cindirêsê" û Istîxbaratên Turkiyê bi hevaltiya Milîseyên "Feyleq Elşam" êriş birin ser Bajaroka "Celemê", û ev hemwelatî "Ibrahîm Xalêd Kenco/26/sal, Elî Bekir Kenco/24/sal, Mistefa Elî Kenco/23/sal, Azad Fadêl Ibrahîm/44/sal, Delîl Mihemed Kedelo/30/sal" girtin, birin navenda Cindirêsê, paşê piştî /24/katan dudiyên paşin bi dandina vêrgiyên diravî berdan, û yên din jî hîn girtî ne, û divê bê zanîn ku berê jî carekê "Delîl" hatiye girtin.

**= Bêserûberî û serberdayetî:**

- Li şeva Yekşemê 8.8.2021an, bi sedema nakokiya li ser avahî û malmewalên desteserkirî, pevçûnina di navbera Milîseyên "Ehrar Elşerqiyê" û "Firqê Nehan - Elfirqe Eltasî'e" de, li kolana vêlat, li Bajarê Efrînê rûdan, çekên sivik û orte têde bi kar hatin, û di encamê de hin endamên herdu aliyan birîndar ketin, hin ziyanên şênberî çêbûn û tirs kete nav sivîlan; Û li roja din, li Reco pevçûn di nav wan de hatin nûkirin. Û berê jî carekê di nav wan de li wir, li Şeva 18.7.2021an û bi heman sedemê, şerekî giran derketibû, û di encamê de dîsa birînadar hebûn, ziyan çêbûbûn û sivîl tirsiya bûn.

- Jêderine ragîhandinî yen xwecihî dan xuyakirin, ku li 9.8.2021an, li Taxa "Efrîna Kevin", di nav hin çekdarên Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" de, bi sedema nelihevkirinê li ser malmewdan û avahiyên desteserkirî, şerekî mezin bi kêr û sungiyan çêbû. Û herweha tekez kirin, ku li 13.8.2021an jî, gizgiziyek di navêna "Asayişa Leşkerî" û Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" de jî derketiye, hin endam birîndar bûne, û seferberî û xirbeliqiyeke leşkerî li Taxa Eşrefiyê - B.Efrînê çêbûye.

Ew tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê yên ku milîseyan bi serpereştiya istîxbaratên Turkiyê li Herêma Efrînê ya dagîrkirî kirine -bi taybetî jî serkêşên wan, mîna "Mihemed Ecasêm" û yên din-, ferz dikin ku sezayine bilez li ser wan werin danîn û pêşkêşî dadgehan bibin, da ku cezayên xwe yên dadmend bixwin.

15.08.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Hevdîtina "Salêm Elmislet" a germ bi "Mihemed Elcasêm" re, li 8.8.2021an, li biryargeha Milîseyên "Firqit Elhemzat".
- Pakrewan: "Ehmed Hisên Beklero" û hevjîna wî "Qudret Beklero keça Ezet", " Elî Ehmed Qadî", û "Ehmed Mihemed Şêxo".
- Ciwanê wendayî "Mihemed Hecîko kurê Henên".
- Dara tûyê ya temenmezin "Dara Mistê" berî û piştî qutkirinê.
- Wêneyeke asîmanî ji G."Qermîtliq" re, koşeya ewlehiyê, Gogêl Êrs - Google Erth.